# Pirsa Kurd



**Wergera ji rusî û amadekar: Fewzi Namli**

**—Raporek balkêş di derheq tevgera netewî ya kurd de**

---

Ev rapor bi navê Hisên Ewnî hatiye nivîsandin. Rapor kurt e û analîzek tevgera netewî ya kurd e. Di raporê de bi gelemperî ji destpêka salên 1800î destpê dike û bi taybetî li ser periyoda destpêka şerê cîhanê yê yekê û heta arîfeya serhildana Şêx Seîd (1925) hatiye nivîsnadin. Hisên Ewnî bi nirxandin, şîrove û informasyon radigîhîne û bala mirovî dikişîne wê perîyodê. Rapor wisa dike ku mirov di derheq wê peryodê de ji nû ve bifikire. Hêja dibînim ku kurd vê raporê bixwînin û karibin sûdê jê werbigrin.

Li gor fermanberê Sowyetî radigîhîne Hisên Ewnî beg mirovekî leşker e (yarbay) û li dibistaneka leşkerî ya Stenbolê mamostetîyê dike. Fermanberê Sovyetî No 15 (navê dizî yê fermanberê sowyetî ye – F.N.) di heman têbîniyê de dinivîse, ku Hisên Ewnî mirovekî veşartî, bi semt e û nakeve nav teferuatan. Ez îhtîmal didimê ku Hisên Ewnî beg mebusê Erziromê yê meclîsa Tirkiyê (salên 1920-1923) be. Jiber ku Hisên Ewnî beg jiber dijberiya kemalîstan ji bo dewra duyê ya meclîsê nayê hilbijartin. Di heman demî de Hisên Ewnî li Stenbolê dimîne û wek parêzer kar dike. Dibe, wî xwe eşkere nekiribe. Lê ev qenaetek e, dikare ne Hisên Ewniyê mebûsê Erziromê lê kesek dî be. Ji ber wê jî naxwazim di derheq nivîskarê raporê de tiştek zêde binivîsim.

Hisên Ewnî (1887-1948) li Kumbet-Karakoçana bajarê Xerputê ji dayik bûye. Li Stenbolê fakulta huquq xwendiye. Wek mebûsê Erziromê di meclîsa Osmaniyan ya taliyê de cîh girtiye. Tê îddiakirin ku piştî girtina meclisa li Stenbolê Hisên Ewnî li ser navê bajarê Beyazîdê wek delege bêşdarî kongreyên Erzirom û Siwasê bûye û wek mebûsê Erziromê di meclîsa Enqereyê dewreyekê (1920-1923) de xebitîye.

Min ti pirtûk, nivîs yan xebatek ji aliyê kurdekî ve di derheq Hisên Ewnî de hatibe nivîsandin nedîtiye. Heger hebe jî ez lê rast nehatime. Ji bo wê jî dibêjim eger xebatek weha hebe dê kefxweş bibim ku bizanim û ji xwendekaran dixazim ku eger karek wisa hebe ji kerema xwe min jê agahdar bikin.

Gelek kesayetiyên tirk (siyasetmedar, nivîskar, rojnamevan û hwd.) yên xwedî nerîn û cereyanên guhertî, di derheq jiyan û xebata siyasî ya Hisên Ewnî de nivîsîne. Helbet hizrên wan li gor bîrûbawerî û berjewendiyên wan in. Her yek ji wan li gor xwe di derheq Hisên Ewnî de dinivîse, şîrove û rexne dike.

Ji bo wî tê gotin: Ew di meclîsê de çalakvanekî aktîv, demokrat û siyasetmedarek cesûr yê li dijî Mistefa Kemal û kemalîstan bû. Di meclîsê de bi navê gruba duyan grubek muxalif damezirandiye û yek ji serkêşên grubê bûye. Ji ber van taybetmendiyên wî kemalîstan nehiştine ew cara duyê bê hilbijartin. Lê ne gotine, Hisên Ewnî rêvberekî kurd bû. Berovajî hertim hewil dane wî wek çalakvanekî demokrat yê tirk nîşan bidin.

Li gor dokumentê li jêr hatiye weşandin Hisên Ewnî rêveberekî kurd e û bi Komîta Stenbolê ya serkêşiya wê Seyîd Evdilqadir dike re pêwendiyên wî hene, yan endamê wê gurubê ye. Nerîn, nirxandin û şîroveyên wî di çerçoveya siyaseta vê grubê de ye.

**Dokument 2.**

Ist. No: 15 (şîfra mirovê sowyetî yê li Stenbolê ye – F.N.)

20. 02. 1925 kopya

## PIRSA KURD

***/Ev nivîs ya serheng-yarbayê kurd, mamosteyê dibistana leşkerî ya li Stenbolê Hisên Ewnî beg[1] e. Li gor çavkaniya me No: 15ê Hisên Ewnî beg nêzîkî tevgera kurdî ye. Ev xebatek li ser Hisên Ewnî ya yekem e û di vê nivîsa xwe de ji ber ku bi dizî dinivîse gelekî bidîqet e, zêde li ser teferuatan ranaweste. Lê di her halûkarî de ev materîal hindek înteresan radigîhîne . Tercûman/[2].***

Zahmet e, heta ne pêkan e ku mirov karibe jimara kurdan ya mitleq bibêje. Çavkaniyên cûda jimarên gelekî ji hev guhertî dibêjin. Ji ber ku heta niha gelek eşîrên kurdan jiyana koçberiyê didomînin û gelek caran li gor demsalan derbazî hela Îranê û Iraqê dibin û ji bilî vê kurd (di nivîsê de ji delva kelîma kurd, tirk hatiye nivîsandin – F.N.) bixwe, ji bo ku baca zêde nedin û zaroyên wan neçin eskeriyê, bi zanetî jimara xwe vedişêrin û kêm nîşan didin. Ji ber wê, ne mimkin e ku mirov bikare îstatîstîkekê çêke û jimarek mutleq bibêje…

Li Kurdistanê, di jiyana mirovan de heta niha teybetiyên çaxa navîn-orta çax û sîstema feodalîzmê mewcûdin. Gelê kurd dabeşî gelek eşîran bûne, beşekî wî jiyanek cîhnîşînî û beşek jî jiyaneka koçerî dijîn.

Kurd di dema siltan Selîm de îltihaqî Tirkiyê (Dewleta Osmanî F.N.) bibûn û rewşa xwe ya feodalî paraztibûn û her wiha ji siltan erd û milk jî stendibûn. Vê rewşê heta dema siltan Mahmûdê II dewam kir. Lê

[1] Min di derheq raportorê vî dokumentî Hisên Ewnî beg de ti agahî bidest nexist. Li gor çavkaniya sowyetî No 15 (diyar e No 15 agent an jî serbazekî sowyetî ye û têkilîya wî bi Hisên Ewnî re hene F.N.) radigihîne: Hisên Ewnî beg mirovekî leşker — yarbay e û li dibistana leşkerî ya li Stenbolê mamostetîyê dike. No 15 di heman têbîniyê de dinivîse ku Hisên Ewnî mirovekî veşartî û bi semt e û nakeve nav teferuata. Ez îhtîmal didimö ku Hisên Ewnî beg mebusê Erziromê yê meclîsa Tirkiyeyê (salên 1920-1923) be. Jiber ku Hisên Ewnî beg jiber dijberiya kemalîstan ji bo dewra duyê ya meclîsê nayê hilbijartin. Di heman demî de Hisên Ewnî li Stenbolê dimîne û wek parezer- awuqat kar dike. Dibe, wî xwe eşkere nekiribe. Lê ev qeneetek e. Ji bo wê jî naxwazim di derheq navborî de tiştek zêde bibêjim.

[2] Tercûman fermanberekî sowyetî ye û bi pirsgirêka netewî ya kurd re eleqeder e. Ew dikare diplomatek yan jî agentekî sowyetî be. Navê xwe li ser raporê nenivîsîye, tenê gotiye "**tercûman**". Diyar e wî rapor tercûme kiriye, lê di heman demî de di derheq rapor û niviskarê raporê de nerînê xwe nivîsîye. Herweha di derheq kesayetî û xebata Yusif Ziya û Xalid Cibrî agahî li raporê zêde kiriye. Herdu nivîs jî piştî rapora Hisên Ewnî û lê bi nirxandina tercûman ya derheq raporê de hatine nivîsandin. Li bin van nivîsan jî nav ne hatiye diyarkirin. Ji nirxandinên wî yên di derheq raporê de îhtîmal didim ku tercûman bixwe ew nivîsîbin.

demê siltan Mahmût dît nufûza begên kurdan xurt dibe û hakîmîyeta wî ya li Kurdistanê di xeterê de ye, biryar da hêdî hêdî begîtî û xanedantiya kurdan ji ortê rake. Bi metodên piralî begên xwedî nufûz ji Kurdistanê derxist. Hin ji wan bi rutbên bilind îqna kir û hin ji wan jî bi zorê sirgunî heremên dûrî Kurdistanê kir.

> Emîrê Hakarya yê taliyê Nurullah beg, emîrê Botan Bedir Xan û Êzdînşêr beg, serhildana asûriyan ya ku bi fenûfût û propagandayên mîsyonerên ingilîzan dihat teşwîq kirin têk birin. Lê her wiha dîsa jî bi fenûfût û zora mîsyoner û konsilê ingilîzan yê Mûsilê, serokên kurdan nefî Girîtê û Warnayê kirin.

Di wî demî de, eşîrên herî mezin û yên bi hev re yekvucûd hereket dikirin ev bûn:

**Baban** li herêma Silêmaniyê. Begên vê eşîretê nufûza xwe xurt kiribûn û hakîmiyeta xwe li herêmek gelek fireh serwer kiribûn. Begên Baban ji bo teslîm nebin, li dijî siltanê tirk demek dirêj micadele kirin. Lê di taliyê de ji teref tirkan de hatin şikandin û serokên wan hatin girtin û hatin nefîkirin, yan jî hatin kuştin.

Eşîrek dî ji yên herî xurt û bihev re hereket dikir, **eşîra Mehemed paşayê navdar yê** li herêma Rewandûzê bû. Mehemed paşa bi dilê xwe teslîmî sultan bû. Mehemed paşa nefî bajarê Îzmîrê bû.

**Begê Hakarya** jî yekî herî xurt û bi navûdeng bû. Her wiha eşîra **Haziran, Botan** yên li herêma **Cizîra ibin Omar in**, ji eşîrên herî xurt bûn.

Emîrê Hakarya yê taliyê Nurullah beg, emîrê Botan Bedir Xan û Izeddinşêr (Yezdanşêr – F.N.) beg, serhildana asûriya ya ku bi fenûfût û propagandayên mîsyonerên ingilîzan dihate teşwîq kirin têk birin. Lê her wiha dîsa jî bi fenûfût û zora mîsyoner û konsilê ingilîzan yê Mûsilê, serokên kurdan nefî Girîtê û Warnayê (li Bilgarîstanê) bûn.

Begên kurdan yên di dereca duyê de jî bi vî rengî hêdî hêdî ji Kurdistanê hatin rakirin û bi heman metodê, tirkan arîstokratiya kurdî têk bir.

Gelê kurd, piştî vê bûyerê ji xan û begên xwe mehrûm ma, xwe li dora şêxan civandin. Ji vê demê pê ve şêxan destpêkirin cihê xan û begên kurdan bigirin.

Ji şêxên ku nufûza wan di nav kurdan de zêde ye, pêwîst e mirov şêx Ubêdillah û kurê wî şêx Evdilkqadir bijmêre. Wan bi artêşek ji 50 000 kurd pêk anîn û heta Tebrîzê girtin. Lê bi midaxaleya Rûsya ya li rojava û bakjurê Kurdistanê serhildan û hakimiyeta wan têk çû û ew jî nefîyê Hîcazê bûn.

Hemû xan, beg û di pê wan re, şêxên nufûza xwe li Kurdistanê xurt dikirin û kurd li cem wan kom dibûn dihatin nefîkirin, yan jî ji teref siltan ve û herwiha bi zordestiya dewletên cîran, serokên kurdan bi rengekî ji ortê dihatin rakirin.

Gava kurd têgîhîştin siltan siyasetek sistematîk, ya gelê kurd bê serok û rêber dihêle dimeşîne, hêdî hêdî ji siltan û ji tirkan sar bûn.

> Hikûmeta partiya Îtîhad û Teraqî û daşnaqan pêkve li dijî kurdan kar dikirin. Hikûmetê bi tesîr û tehrîqên taşnaqan dest bi girtin û kuştina gelek kesayetîyên Kurdistanê, yên xwedî nufûz kir.

Her çiqas siltan Evdihemîdê IIyê hindek îmkan dabe kurdan û damezirîna alayên “Hemîdiye” yên leşkerî qismî be jî hindek daxwazên kurdan bi cîh anî. Lê paşê alayên “Hemîdiyê” yên ji rutbe û rewşa xwe razî destpêkirin ku bi karbidestên tirkan ve zordestîyê li gelê kurd bikin. Dema kurdan rastiya van çalakiyan fêm kir bawerî û razîbûna wî qismî jî ji ortê rabû û nerazîbûn û bêbawerî ket şûna wê.

Mirov şaş dimîne! Împeratoriya Osmanî – împeratoriyek arîstokratî bû Hebûna xwe bi çîna arîstokrat berdewam dikir, diviya bû çîna arîstokrat xurt bikira û biparazta. Lê dewleta Osmanî di pirsa kurdî de siyasetek guhertî dimeşand. Wê siyaseta têkbirina arîstokratiya kurdî dimeşand. Ev tenê tiştekî aşkere dike: Kurdistana netewî ji mêj de ji bo împeratoriya Osmanî xeter temsîl dikir û arîstokratiya tirkan û ya kurdan ne wek hev difikirî û di nav wan de nakokî hebû.

Îlankirina destûra bingehîn rewşa kurdan xeraptir kir û her wiha nerazîbûna kurdan ya li dijî Tirkiyê jî zêdetir kir. Hikûmeta partiya Îtîhad û Teraqî û daşnaqan (partiya ermenî ya wî demî F.N.) pêkve li dijî kurdan kar dikir. Hikûmetê bi tesîr û tehrîqên taşnaqan dest bi girtin û kuştina gelek kesayetîyên Kurdistanê, yên xwedî nufûz kir. Gelek ji wan hatin girtin û yên mayî, ji neçarî revîyan serê çiyan û xwe li wan deveran veşartin. Hemû ev teqîbat di bin navê: Micadeleya li dijî mirovên li dijî qanûna bingehîn dihat kirin.

> Çalakiya herî bitirs û bêqanûnî ya hikûmetê û partiya Îtîhad û Teraqî, prowakasyona bûyera li Bedlîsê bû. Di netîca vê bûyerê de şêxên kurdan yên navdar û xwedî nufûz: Şêx Elî, Şêx Şîrîn, Şêx Celaledîn - kurên şêxê bi navûdeng û her wiha kurên şêx Selîm û gelek alim û kurdên dî yên xwedî nufûz hatin îdam kirin.

Çalakiya herî bitirs û bêqanûnî ya hikûmetê û partiya Îtîhad û Teraqî, prowakasyona bûyera li Bedlîsê bû. Di netîca vê bûyerê de şêxên kurd an yên navdar û xwedî nufûz: Şêx Elî, Şêx Şîrîn, Şêx Celaledîn - kurên şêxê bi navûdeng û her wiha kurên şêx Selîm û gelek alim û kurdên dî yên xwedî nufûz hatin îdam kirin. Vê bûyerê kerba kurdan zêde kir. Lê

şerê li Balkan û paşê şerê Cîhanê yê yekê rewş guhert. Di bin tehdîda ku dagirkirina welêt ya ji teref dijminên ji derve, yên ne misilman ve, gelê kurd hemû malxerabî-xerez ji bîr kir. Kurd ji bo paraztina welatê xwe pêkve bi tirkan re çek hilgirtin. Ji bilî kurdên Dêrsimê yên şiî-alewî, ku li cepha Kafkazê serî hildan, kurdên dî hemû, di hemû cephan de bi diristî şer kirin û Tirkiye paraztin. Eger kurdan pêkve li aliyê tirkan şer nekiriba û hinekî bêhereket-pasîf mabûna, dê tevaya Tirkiyê di demek zûtir de, têk biçûya. Helbet, piştî vê bûyerê kurdan hêvî dikirin ku tirk dê di pêwendiyên xwe yên bi kurdan re hîn bi miqate û bi dostane bin. Bi rastî kurdan hêvîya gelek tiştên erênî ji wan (ji tirkan – F.N.) dikir.

Piştî serketina Tirkiyê, siyaseta wê ya derheq kurdan de rengekî hîn pirtir tehdîtkar, bi şubhe û qurre stend. Tirk rê nadin kurdên navdar û zana, da karibin di saziyên dewletê yên giring de kar bikin. Her weha rê nadin wan heta di saziyên dewletê yên dereca duyê û siyê de jî kar bikin. Eger di hin saziyan de çend kurd hebin, hewl didin wan ji wir bavêjin û tirkan di şûna wan xin.

Di demê tevgera netewî û şerê azadiyê de, fikrên netewî ji bona tirkan derketin merheleya herî bilind. Lê wan fikrên netewî yên kurdan jibîr kirin û nexwestin bînin bîra xwe. Gava rewşa kurdan hinekî baş dibû, kurd sempatî û alîkariya xwe nîşan didan, lê tirkan tersî kurdan, li hemberî rewşek weha helwestek bi dijminatî dimeşandin û bi şibhe li kurdan dinerîn. Siyasetek weha bû sedemê kurd di demê hereketa netewî ya tirkan de şaş bimînin û di pirsa çareserkirina Kurdistanê de bêbiryar bimînin.

Piştî serketina Tirkiyê, siyaseta wê ya di derheq kurdan de rengekî hîn tehdîtkar, bi şubhe û qurre stend. Tirk rê nadin kurdên navdar û zana, da karibin di saziyên dewletê yên giring de kar bikin. Her weha rê nadin wan heta di saziyên dewletê yên dereca duyê û siyê de jî kar bikin. Eger di hin saziyan de çend kurd hebin, hewl didin wan ji wir bavêjin û tirkan di şûna wan xin.

Mafê Kurdistanê heye 50 – 60 mebûsan bişîne meclîsa Enqerê. Lê birastî di meclîsê de mebûsekî bi dengên kurdan li ser navê Kurdistanê hatibe hilbijartin nîne. Mebûsên ji herêmên kurdan anîne Enqerê bi kurdan re ti pêwendiyên wan tunene û ji ber wê jî kurd pirtir hêrs dibin. Eger em bala xwe nedin hemû van kêmxistin û biçûk dîtina mafên kurdan rewş ev e: Tirk bi temamî kurdan bi tiştekî nahesibînin, dikarin kurdan hêrs bikin û wan mecbûr dikin ku di derheq rewşa xwe ya îro û ya pêş de bifikirin.

Di demê me de, tirk çi bi rastî û çi bi derewan, bi her awayî hebûna milletê kurd înkar dikin û bi teybetî li Tirkiyê. Ew hewl didin îsbat bikin ku di nav tirkan û kurdan de ti ferq tuneye û bi vî rengî înkara hebûna pirsa kurd dikin û dibêjin Tirkiye welatê tirka ye. Bi rastî siyasetek weha divê bê vê wateyê: Yan kurd divê ji Tirkiyê cûda bibin,

yan jî ji bona ew jî bibin tirk, divê hemû teybetmendiyên kurdan yên wek ziman ûrf û adet û hwd. tune bikin. Wek tê zanîn tirk cûdabûna kurdan qebûl nakin û ew dê ti caran jî qebûl nekin. Ev tê wê wateyê: Divê em li benda alternatîva duyan bin (ango bi têkçûnê razî bibin - F.N.).

Kurd li siyasetek weha bi nefret û bi teredut dinerin. Kurd hewl didin bi zimanekî erênî tirkan îqna bikin ku ev siyaset siyasetek gelek bi zerer e. Lê ti pêwendiyên kurdan yên dostane yên bi tirkan re nikare bi tirkan bide qebûlkirin ku divê ew dest ji vê şowenîzmê berdin. Digel van pêwendiyan û vê siyaseta tirkan ya neyînî ku dikare dahatûya kurdan têxe rewşek herî tarî û herî bitirs jî kurd dîsa jî hewl didin bi skûnet û bi sebir bersiva wan bidin.

Têkbirina rêberên kurdan bi bûyera li Bedlîsê bidawî nehat. Di salên taliyê yên desthilatiya siltan Ebdilhemîd jiber sedema kuştina Rizwan paşa Elî Şamil paşa û birayê wî Evdilrizaq beg (Bedirxanî ne - F.N.) nefî Trîpolî û Yemenê bûn. Digel ku efûya giştî hat ragîhandin jî Elî Şamil paşa û Evdilrizaq beg neketin ber vê efûyê. Şamil paşa li surgunê mir û her çiqas piştî demekê Evdilrizaq beg bi awakî fermî hat efûkirin jî lê bîryara kuştina wî ji teref partiya Îtîhad û Teraqî ve hat standin. Gava Evdilrizaq beg ji vê biryarê agahdar bû revî çû Rûsyayê. Ewdilrizaq beg heta herba Cihanê ya yekê bi mevanperwerî û paraztina rûsan li Rûsyayê jiya. Di demê herba cîhanê de rûsan dixwastin nufûza Ewdilrezaq beg ya di nav kurdan de ji bo xwe bikarbînin û ji bo wê jî ew anîn herêma Kafkasyayê. Rûsan bi alîkariya wî destpêkirin li herêmên Tirkiyê û Îranê yên ku kurd lê dijiyan yekineyên kurdî damezirînin lê piraniya kurdan beşdarî vî karî nebûn.

Rûsya berî herba Cîhanê û herweha di dema wê de jî di nav kurdan de bi xurtî propaganda Kurdistanek serbixwe ya di bin hîmaya – paraztina Rûsyayê de dikir. Kinyazê navdar Borîs Şaxovskoy propagandayek weha li başûrê Kurdistanê dikir. Li bakur karbidestê wezareta derve prens Vasiliy Hacîmîkov di nav kurdên herêmên Dersim, Erzirom û Hesen beg Lordkîpanîdzê jî li Erzîncanê heman propagande dimeşand.

Encamên propagandeyên weha ev bû: Dema serleşkerê rûsî Nîkolay Nikolayevîç hat Erzîncanê şêx û nûnerên kurdan yên ji herêmên ne di bin destên rûsan de Mistafa ji Pilumurê û Elîşêr beg ji Sîwasê û yên wekîdin hatin cem wî (Nikolay Nikolayeviç F.N.). Serleşkerê rûsî çek, cebilxane û her wiha nîşan, medalye û pere da wan.

> Yan jî di haletek berovajî de; diviya bû kurd têketana bin hîmaya, Rûsyayê yan Ermenistanê, yan Ingilîztanê, yan jî Amerîkayê. Lê wan jî tu sozên baş ne didan kurdan. Ji bo wê jî kurdan, ji xirabiyê ya herî biçûk, ango mayina bi tirkan re tercîh kirin.

Ebdilrezaq beg piştî şoreşa li Rûsyayê û têk çûna ordiya Rûsyayê ya berê ji sozên ji teref hukûmeta Tirkiyê de hatibûn dayin, bawer kir. Sozên hukûmeta Tirkiyê ev bûn: Hemû tawanên Evdilrizak beg efû bûne û hemû mal û milkê wî û her wiha malîkana wî dê li wî bê vegerandin. Li ser van sozên tirkan, Evdilrezaq beg hat Stenbolê, lê hikûmeta Tirkiyê wisa da xuyakirin ku dê erd û malîkana wî lê vegerîne ew şand Mûsilê û li wê derê bi destê heman hikûmetê hat kuştin.

Bi vî rengî, bi rexmê pêwendiyên tirkan yên bi kurdan re dijminatî bûn jî kurd ji ber rewşa wî demî bi Tirkiyê re dilsoz man. Yan jî di haletek berovajî de; diviya bû kurd têketana bin hîmaya, Rûsyayê, yan Ermenistanê, yan Ingilistanê, yan jî Amerîkayê. Lê wan jî tu sozên baş ne didan kurdan. Ji bo wê jî kurdan, ji xirabiyê ya herî biçûk, ango mayina bi tirkan re tercîh kirin.

Ev haletê rûhîyeya kurdan û şertên wî demî diyar dike. Piştî rawestandinê şerî pirsa Tirkiye bi temamî were parvekirin derket holê. Vê pirsê bandorek xurt li ser kurdan hişt û ji ber wê jî bi hev ketin. Dema axaftin di derheq Ermenîstana mezin (ya tixûbên wê ji Erîvanê dighişt heta Mersînê û tevaya Kurdistanê diket nav tixûbên wê) dihatin kirin û plan li ser wê dihatin çêkirin, bandora wê ya neyînî li ser kurdan xurtir bibû.

> Lê ev ne dihat wê wateyê ku kurdan bi temamî ji Tirkîyê re serî danîne û teslîm bûne. Wek min li jor jî îşaret kir; kurdan xirabiya herî biçûk-ehwenîşer hilbijartin. Lê kurdan li dijî vê xirabiyê micadeleya xwe berdewam kirin û ne tenê carekê mucadela xwe li dijî serweriya tirkan meşandin.

Ji ber vê rewşê kurdan komîteya[3] xwe avakirin û vê komîteyê berê xwe da hukûmeta tirkan. Lê wî demî hukûmeta tirkan ne di rewşek weha de bû ku kariba hin gavan pêşde bavêje. Ji ber wê jî komîta kurd di dema konferansa Parîsê de nûnerên xwe şand cihê konferansê. Di konferansê de kurdan daxwaza Kurdistanek otonom ya di bin hîmaya Tirkiyêde kirin. Digel wê kurdan biryar stend: Heger daxwaza otonomiyê pêk neyê ew dê hingê daxwaza damezirandina Kurdistanek serbixwe bikin.

Bi rexmê nûnerên komîteyê di konferansê de tiştek bi dest nexistin û heta ti soz jî nestendin, lê wê gavê nûnerên kurd bi wan dan îsbatkirin ku tu pêwendiya kurdan bi plana Ermenistana mezin tuneye û herweha pirsa kurdî jî ya ermeniyan ne kêmgirîngtir e. Di wî demî de pirsa ermenî hêdî hêdî ehemiyeta xwe wenda dikir. Destpêkirina hereketa netewî ya li Tirkiyê derbên bi ezim li ermeniyan xist û ji ber vê bûyerê girîngîya pirsa kurdî ket planê duyan.

[3] *Qest ji Komîta Kurd, "Kurd Tealî Cemîyetî" ye*

Lê ev ne dihat wê wateyê ku kurdan bi temamî ji Tirkîyê re serî danîne û teslîm bûn. Wek min li jor jû îşaret kir; kurdan xirabiya herî biçûk-ehwenîşer hilbijartin. Lê kurdan li dijî vê xirabiyê micadeleya xwe berdewam kirin û ne tenê carekê mucadela xwe li dijî serweriya tirkan meşandin. Dema tirk destpê dikin bi hemû tedbîran rewşa xwe xurt bikin bacê didin hev û ji bo leşkeriyê xortên kurdan didin hev, tevaya gelê kurd tavilê li dijî wan radiweste û caran jî bi şerê çekdarî bersîva wan dide. Di bûyerên wisa dê tirk leşkerên xwe li herêmên bûyer lê rû didan kom dikirin û bombe berdidan ser serê xelkê kurd û mal û milkên wan têk dibirin.

Di sala 1921ê de artêşa tirk, serhildana li herêmên Dersimê û Zarayê, bi awakî dirinde şikand. Hemû deverên mirov lê dijiyan hatin bombe kirin û tevaya herêmê ji teref çeteyên Osmanê Topal hatin talan kirin. Bi taybetî piştî serkeftina tirkan li dijî yûnaniyan tedbîrên weha yên li dijî kurdan ji berê zêdetir dihat stendin û tên stendin. Liberxwedanek herî biçûk di cihê xwe de tê perçiqandin.

> Tiştekî balkêş e, tirkên nîjadperestîyê û şowanizmê pêş dixin naxwazin hebûna ruhê netewî yê kurdan qebûl bikin. Piştî wê jî dibêjin goya bîr û baweriyên netewî yên kurdan encamên propaganda û tehrîqên biyaniyan in û ango xepandin û xwexapandin e.

Dengê bombên tirkan bi leza birûskan li ser hemû herêmên Kurdistanê dibarin. Di dema nuha de kurdan hemû hêvî û xêrxwastina tirkan winda kirine û destpêkirine bi xurtî û cidî ji nûh de bifikirin. Lê ji bo mirov karibe bilez û hêsanî biryarek esasî bistîne rewşa Kurdistanê gelekî xeter e. Kurdistan perçeyek-gepek weha ye: Çavê hemû cîranan lê ye û hemû pêlên ciddî yên li Kurdistanê radibin, tavilê ji teref hêzên li vê deverê xwedî berjewendî tê midaxele kirin. Zahmet e mirov karibe bejê, ka dê encamên wê çibin û kijan ji hêzên herî xurt dê karibe lepên xwe deyne ser Kurdistanê. Divê ev bi serehat bê diyarkirin: Jiber ku kurd bixwe jî ji bo Kurdistanek serbixwe ne amade ne.

Di mehên dawîyê de di rojnameyan de tê ragîhandin ku mebûsê berê yê meclîsê, yê ji Bedlîsê Yûsif Ziya beg û albay Xalid beg li Erziromê hatine girtin. —Di îlaweyê de li bîografîya wan binere.— Herweha agahî hene ku li cepha Mûsilê tabûrek kurdî bi serokatiya komandar kaptanê xwe sînor derbaskiriye û teslîmî iraqiyan bûye. Helbet ne pêkan e ku ev agahî hemû raya giştî ya tirkiyê xemgîn neke. Anha jî gelek axaftin di derheq kurd û Kurdistanê tên kirin. Hukûmeta Tirkiyê hewl dide îsbat bike ku ev hemû encamên propagandeya dijminatî û tehrîqkirinê ye û Yûsif Ziya beg û Xalid beg yên girtî jî bi îxaneta li dijî welat (Tirkîyê - F.N.) tên tawanbarkirin.

Bi vê ve girêdayî hukûmet û tirkên şowenîst li dijî komîta kurd “Kurd Tealî Cemiyetî” ya li Stenbolê di demê şer rawestandinê de ji bo berjewendiyên tirkan kar dikir, dest bi tawanan kirine. Ew dibêjin ku ev komîte di nav kurdan de propagandayê li dijî hikûmetê dike. Ev jî bêhurmetiya tirkan ya di derheq pirsa kurdî dide diyar dike, yan jî dixwazin (tirk -F.N.) bi zanetî hebûna tevgera netewî û ruhê netewî yê di nav kurdan de nebînin û bi şêweyek bêdeng wî ruhî veşêrin. Lê ew çiqas hewl didin ku hebûna tevgera kurdî veşêrin jî ne pêkan e karibin wê li tevaya Kurdistanê bikin û ji bo wê jî ev rewş li cem tirkan û hikûmeta wan tirs û gûmanên meşrû peyda dike.

Lê nerast e mirov tewgera netewî ya kurd wek tevgerek li dijî hikûmetê û Tirkiyê binirxîne. Ew encamên pêşketina ruhê netewî ya tirkî ye ku di nav kurdan de jî belav bûye. Eger tirk bi bawerî û bi himmet bi ser vê pirsê (pirsa kurd) de hatibana ew dê ji bo berjewendiyên wan û Tirkiyê baş bûya. Di rewşa tirk tevgera kurd ji xwe re tehdît dibînin û mirovên wê taqîb dikin tenê dikare bibe alîkar ku kurdan li dijî wan rawestîne. Tevgera kurd ya vî demî ji bona kurdan pêşketinê di warê kulturî û aborî de dixwaze lê ji ber taqîbên tirkan dikare îstîqametek bi her awayî guhertî ya ku ji bo Tirkiyê nebaş be bistîne.

Tiştekî balkêş e, tirkên nîjadperestîyê û şowanizmê pêş dixin, naxwazin hebûna ruhê netewî yê kurdan qebûl bikin. Piştî wê jî dibêjin, xwedêgiravî bîr û baweriyên netewî yên kurdî encamên propaganda û tehrîqên biyaniyan in û ango xepandin û xwexapandin e.

Tirk îşaret dikin ku: Nevîyê Şêx Ubêdillah Seyîd Taha bi ingilîzan re ye û ji bona berjewendiyên wan kar dike. Lê ev ne îsbat e ku hemû kurd li pê Seyîd Taha diçin û herweha kurdan ew şandibin cem îngîlîzan. Her çiqas ew merivê Şêx Evdilqadir (Seyîd Abdulqadir - F.N.) ê, nufûz û mirîdên wî li wîlayeta Hekkarî, Kurdistana Iranê û li herêmên Xoy û Ûrmiyê hene, belê her weha nufûza Seyîd Taha jî li van herêman heye, lê nufûza wî ji ya şêx Ebdilqadir gelekî kêmtir e. Ji bilî wê li dijî Seyîd Taha li van herêman ji teref tirkan ve propagande tê kirin û ev jî dibe sedemê lawazkirina nufûza wî.

Mistefa paşayê kurd, bi rastî ji bona hukûmeta Iraqê û ingilîzan kar û propagandeyê dike. Lê ew ne ji malbateke navdar e û herweha di nav herêm û eşîrên deverên dî de kêm tê naskirin. Herweha Mewlanî-zade Rafet beg jî. Bandora wan tenê bi şexsiyeta wan ve girêdayî ye û ne malbatî ye. Bandora malbatî ya warisî li cem kurdan gelek giring e.

Bi vî rengî, Seyîd Taha, Mistefa paşayê ji Silêmaniyê û Mewlanî-zade Rafet paşa ji bona berjewendiyên îngîlîzan kar dikin. Lê karê wan ji xwestina kurdan bêtir encamên comerdiya ingilîzan e. Lê ev nayê wê wateyê ku mirov divê vêya wek îstîqameta kurdan hesab bike. Ligel vê hemû neteweyên li cem wan sîstema feodalîzmê heye ji ber bûyerek weha derban dixwin. Ingilîzî vê rewşê baş dixwînin û bi nirxê mîlyonan pere begên feodal yên xwedî nufûz dikirin.

Hemû rîwayet û gotinên dî ku Kurdistan serxwebûnê di bin hîmaya Îngilîz de dixwaze û talep dike ne rast e. Ev tenê propaganda Îngîlîz û hevalbendê wan yên xwefroş e. Ji bilî asûriyan ji ber ku ew birastî dixwazin di bin hîmaya Îngîlîzan de bin hindek kurdên ji teref îngîlîzan de hatine kirîn jî heman daxwazê dikin. Kurdistan wek yekîtiyek netewî yekgirtî dê bi dilê xwe nekeve bin hîmaya ingilîzan. Wek hemû dizanin û herweha bizavkerin kurd jî baş dizanin ku lozinga siyaseta îngîlîzan ev e: "Perçe bike û îdare bike" û ji ber wê jî kurdên hewl didin yekîtiyek netewî damezirînin dê vê siyasetê qebûl nekin. Her wiha ew mirovên derheq vê mijarê de diaxivin diyar e armanca ruhê netewî yê kurdî nizanin û kurdan nas nakin.

Derheq rûsan de ew ji serê 50 salî de hewl didin kurdan bînin alîyê xwe. Ji ber heman sedeman Ebdilrezaq Bedirxan hîmaye kirin. Kurd zen dikin siyaseta Rûsyayê dagirkirina rojhilatê Asyayê ye û ji ber wê jî ew naxwazin bi wê re pêwendiyên siyasî deynin.

Encam, ji bona Kurdistana pêk bê rewşa herî baş ev e:

**a)** Kurdistanek otonom di bin hîmaya Tirkiyê de yan jî
**b)** Eger ji ber şertan otonomî nepêkan be wê gavê divê Kurdistan bi temamî serbixwe be.

Meyla piraniya bizavkerên kurd bi vê armancê re ye. Her çi armanca kurdan ya nîhaî mitleq serxwebûna Kurdistanê ye belê bizavkerên kurd dihesibînin welat ji bona serxebûnek mitleq— çi di warê iqtisadî û çi di warê civakî-siyasî de— ne hatiye amadekirin. Hemû hewildanên kurdan yên ji bona serxwebûnê dê girêdanek îqtîsadî û siyasî ya bi dewletên zilhêz û dewlemend re bîne û di encamê de Kurdistan dê bibe qoloniya dewletên Ewrupî. Madem weha ye wê gavê ji bona kurdan ya herî baş ew ê ku ew di bin hîmaya Tirkiyê ya zeîf de bimînin û ji bona ku serxwebûnê bistînin divê di heman demî de hêza xwe birêxistin bikin. Standina serxwebûnê ji Tirkiyê dê ji azadiya di bin lepên ingilîzan de gelekî hêsanîtir be. Lê divê ez li vê derê dîsa nîşan bikim: Eger tirk siyaseta xwe ya di derheq pêwendiyên bi kurdan re biguherin û piştgirîya pêşketina netewî-kulturî ya gelê kurd bikin û li dijî kurdan tevnegerin dê vê pirsê bi awakî gelek hêsanîtir çareser bikin.

Her wiha kurdên li wîlayeta Mûsilê jî ne ji hikûmeta Iraqê û ne jî ji tehakûma ingilîzan razî ne. Tevlîhevî û serhildanên kurdan yên daîmî ispata vê ye.

Di destpêka dagirkirina Silemaniyê ya ji teref ingilîzan de bi alîkariya îngîlîzan hukûmeta şêx Mehmûd hat damezirandin. Piştî demekê Şêx Mahmûd bi xwe li dijî ingilîzan serî hilda lê di netîca şer de ew hat şikandin û ingilîzan ew surgunî girava Seylan-Srîlankayê kirin . Piştî demekê bi hewldanên hin mirovên navdar û xwedî nufûz şêx Mehmûd hat berdan û vegeriya Silêmaniyê. Lê di sala buhirî de wî (Şêx Mahmud - F.N.) dîsa li dijî ingilîzan serî hilda. Ingilîz mecbûr man bi firokeyên

cengî Silêmaniyê û herêmêm derdora wê bombe bikin û gelek gund û avayî têk birin. Her çiqas di destpêkê de hikûmeta şêx Mehmûd bi hewldanên ingilîzan hat damezirandin jî lê di rastiya xwe de diyar bû ku pêwendiyên Şêx Mehmûd bi hikûmeta tirkan re hene. Rewşa bûrayê Şêx Mehmûd serpel-kapîtan Fetah beg ku anha li ser navê Mûsilê mebûsê meclîsê ye û li Enqerê ye vê tesdîq dike. Ew beşdarî xebata meclîsê nabe lê maaşê mebûstiyê distîne û mirov dikare bibêje ji bona pêwendiyan her dem li Enqerê ye.

Komîta Kurdî "Kurdîstan Tealî Cemîyetî" di dema agirbestê li Konstantinopol-Stenbolê hat damezirandin û berî sala 1920ê xebatek xurt pêşde xist. Endamên Komîteyê di 1920ê de jihev cuda bûn û bûn du grup: otonomîxwaz û serxwebûnxwaz. SEYID ABDILQADIR, çend kesên Bedirxanî û yên din ototnomî dixwestin. Endamên dî yên Komîteyê: Doktor ŞUKRÎ MIHEMED (Şukrî Mihemed Sekban - F.N.) beg, MEWLANÎ ZADE RAFET beg û çend kesên Bedirxanî doza Kurdistanek serbixwe dikirin û digotin pêşketina Kurdistanê bê serxwebûnek kamil ne pêkan e.

Helbet serxwebûnxwaz surgunî derveyî tuxûbên Tirkiyê bûn.
Doktor ŞUKRÎ MIHEMED beg bi rexmê li Stenbolê doktorekî herî baş bû, halxweş û zengîn bû hemû îmkanên xwe danî alîyekî û berê çû Beyrûdê û ji wê derê derbasî Baxdadê bû. Ew anha li Baxdadê xebata ji bo serxwebûnek kamil ya Kurdistanê berdewam dike. MEWLANÎZADE RAFET beg wek li jor hatibû diyarkirin ji bo berjewendiyên îngîlîzan kar dike ango ji bo serxwebûnek di bin hîmaya îngîlîzan de. Çend kesên endamên gruba otonomîxwaz li Stenbolê dimînin lê di demê me de xebateke berbiçav û cidî nakin. Mirov dikare bibêje Komîte têkçûye lê ABDILQADIR wek rêvebirekî kurd yê xwedî bandor û populer tê dîtin û nufûza wî di nav kurdan de bihêz e.

## *Li gor hemû encamên li jor hatine gotin mirov dikare tevgera kurdî netewî beşî du[4] cereyanan bike[5]*

**Cereyana yekê:** Daxwaza otonomîyê di nav tixûbên Tirkiyê de dike. Armanca wan bidestxistina otonomîyê ye û bi vê otonomîyê peyda kirina derfetên pêşketina welêt di warê kulturî, aborî û civakî de ye. Di pêş de demê pêşketina civakî û îqtîsadî ya welêt pêk bê dê derfetên Kurdistan karibe li ser lingên xwe raweste amade bike. Bi rewşê ve girêdayî û eger pêwîstiya wê bê qebûlkirin em dikarin serxwebûna Kurdistanê bidestxin.Ev cereyan ya herî bihêz û hêja ye û divê bala mirov li ser be. Rêvebirê herî bi bandor SEYID ABDILQADIR e.

[4] Raportor behsa du cereyanên esasî dike lê paşê duyên dî jî lê zêde dike. Her çenda wî nimara sê û çarê wek min ne nivisiye jî ew herduyên paşî jî wek du cereyanan dinivîse. Lewra min jî ew wek dewama herduyên berê sê û çar nivîsand.

[5] Şirove û nirxandinên hatine kirin aîdî fermanberê sowyetî (tercuman) ne.

**Cereyana paqij ya kurdî ya duyê:** Cereyana terefê KURDISTANEK BI HER AWAYÎ SERBIXWE. Ev cereyana ji cereyana yekem lawaztir e û layengerê cereyana yekê (otonomixwaz - F.N.) vê cereyanê wek avanturistiyek xeter binav dikin. Doktor Mihemed Şukrî beg ku anha li Baxdadê ye çalakvanê binavûdeng yê vê cereyanê ye. Mihemed Şukrî beg bi rexmê layengerê serxwebûnê ye girêdayî bi rewş û berjewendiyên serxwebûnê muhtemel e di nav têkîlîyên siyasî û lihevkirinên cuda yên bi dewletan re be.

**Cereyana sêyê**: Layengerên vê cereyanê girêdana bi temamî ya bi Tirkiyê re ne. Di vê cereyanê de kurdên ji dewletê rutbe, wezife, nav, mebûstî bidestxistine û kesayetiyên dî yên siyasî yên di jiyana tirkiyê de rolek wan gring heye, cîh digrin. Wek nimûne: FEYZÎ beg komîserê karê civakî, mebûsên kurd: ZULFÎ beg, BADRÎ axa, DIYAB axa û kurdên dî yên turkîfîze (asîmîle- F.N.) bûnin. Layengerê vê cereyanê jî têra xwe gelek in. Ev kurdên turkîfîze bûyine û ti girêdanên wan bi kurd û Kurdistanê ve nemane. Jimara kurdên bûne peyayên dewletê li Kurdistanê ne hindik e.

**Cereyana talî-çarê**: Layengerê protektorat-hîmaya îngîlîzan. Çalakvanên vê cereyanê yên herî berbiçav ajanên îngîlîzan SEYID TAHAYê karbidestê îngîlîzan, MUSTAFA paşayê kurd ji Sulemaniyê û MEWLANÎZADE RIFAT beg in. Ew dihesibînin, ku pêşketina Kurdistanê ya di warê aborî û civakî de tenê bi alîkariya Îngîlîstana dewlemend pêkan e.

**Têbînîyên min (tercûman - F.N.) derheq raporê de**

Ji bilî ku rapor karakterek wê sethî û gelemperî heye, di raporê de di derheq îstîqameta siyasî ya rêvebirên wek XALID beg (Xalid Cibrî - F.N.) û SIMKO bi qest yan jî bi nezanebûn nehatine nîşankirin. Mirov dikare ji raporê bigihê encama ku pêwendiyên raportor (Hisên Ewnî - F.N.) bi Komîta Stenbolê ya doza otonomîyê dike re heye, yan jî di gel wan kar dike. Tevaya raporê bi ruhekî acizî û libergerandina tirkan hatiye nivîsandin. Mirov wer têdigihê ku bêbiryarî îfadeya haletî ruhê Komîta Stenbolê ye. Herweha tu agahî di derheq îstîqameta ber bi Rûsyayê de jî tune ne. Mirov dikare wê bi nezaniya raportor ya di derheq hebûna îstîqametek weha yan jî dijminatiya wî ya li hember îstîqametek weha û bi qest û bi bêdeng mayinê îzah bike. **(Tercuman)**

**ÎLAWE JI BO PIRSA KURD**

**YÛSIF ZIYA EFENDÎ**

Yûsif Ziya efendî perwerdeya pileya orte xwendiye û berî destpêka tevgera şoreşgerî ya tirkan (tevgera M. Kemal – F.N.) li Bedlîsê karbidestekî dewletê yê pila ortê bû. Y. Ziya, ji destpêka rojên tevgera netewî ya tirk ji bo wê xizmetên mezin kirine û di encamên wê de li ser navê bajarê Bedlîsê bû mebûsê meclîsa Enqerê ê dewra yekê. Y. Ziya di meclîsê de li dijî hewlên M. Kemal yên dîktatorî derdiket û ji ber wê jî li cem grûba duyan (gruba mixalifên M. Kemal – F.N.) helwest stend. Ew di gruba xwe de endamekî têra xwe çalak û zîrek bû. Ji ber wê hukûmetê li dijî wî, ji bo dewra dudiya ya meclîsê neyê hilbijartin, hemû tedbîr stend. Piştî wê Y. Ziya li dijî hikûmetê û partiya gel helwestek dijwartir girt û ajîtasyona li dijî wan berdewam kir. Xebata Y. Ziya ya li dijî hukûmetê bi tevayî û taybetî li herêmên /rojhilat, kurdan/ ji bo hikûmetê gelekî xeter bû. Her çiqas ji mêj de biryara girtina wî hebû lê ji bo girtina wî tu wesîle ne didîtin tenê teqîb û çavdêriya wî dikirin.

Paşê di destpêka meha yekê-januari ya vê salê (1925) de, di heman demê ew û Xalid beg pêkve hatin girtin û bi rexmê ew ne mirovekî leşker bû jî, ew şandine mahkema leşkerî ya Bedlîsê. Y. Ziya ji bo ku pêwendiyên wî bi Îhsan beg (Ihsan Nurî F.N.) re hebûn sûçdar dikin. Ihsan beg qumandanê alaya kurdî (alaya eşîretê – F.N.) ye. Derbazî terefê ingilîzan bûye û sûcê wî îxanet e. Tê gotin ku sê sal cezayê hebsê dane Y. Ziya.

Yûsif Ziya efendî ne serokekî kurdan yê bi navûdeng e û bandorek wî ya mezin jî di nav kurdan de tuneye. Lê ew mirovekî gelek zîrek û bizavkar e. Ew ji bizavkarekî kurd bêtir wek endamêkî zîrek yê grûba duyan (meclisa tirkan F.N.) ji bo hikûmetê xeter bû.

**ÎLAWE JI BONA PIRSA KURD**

**TEYBETIYÊN XALID BEGÊ**

Miralay Xalit Beg xwendina xwe li “Aşîret Mektebî “ ya li Stenbolê kiriye. Piştî qedandina dibastanê bû serokê tumena eşîretî ya Kurd ya ji çar alayên eşîretî yên Cibranîyan pêk dihat. Xalid beg ji wê rojê pê de dest pê kir bi hemû enerjiya xwe fêrî ilmê tarîx, dîn û hwd. bibe: Bi vê xebata xwe giha encamên baş. Di vî demî de di nav kurdan de bû mirovê herî têgîhîştî. Di warê xebata leşkerî de bi xîret dixebitî û derheq pirsên leşkerî de zanebûnek mezin nîşan da. Xalit Beg bi saya xwendin, enerjî û xusûsîyetên xwe yên dî sempatî û hurmeta xelkê Kurd stend. Karekî bi esas li ser pirsa kurdî, tarîxa kurdan, ûrf û adet û jiyana kurdan kir. Xalid Beg bi vê xebata xwe bû mirovekî terefdarê

pêşketin û dewlemendîya xelkê Kurd. Xalid Beg fikrên xwe ji kesekî venedişart û ji herkesî re digot.

Di dema hereketa neteweyî ya tirkan de Xalid Beg bi wan re helwest ne girt, xwe da alîyekî. Wî gellek caran îstîfa xwe xwest û dixwest biserbestî karê civakî û siyasî bike. Lê heta nuha ew dê vê daxwaza xwe de biser neketiye. Jiber ku çalakiyên wî yên siyasî ne li gor dilê hukûmeta tirk bû. Tirkan hertim hewl didan wî di bin disiplina leşkerî de bihêlin.

Dibêjin demê Kemal Paşa hat Erziromê Xalid beg dît û jê xwest ku ji fikra îstîfakirinê vegerîne. Lê Xalid beg her li ser biryara xwe ma û xwest îstîfa wî bê qebûlkirin. Di dema taliyê de Xalid beg biryar daye bi serehetî dest bi xebatê bike.

Di dest pêka meha yekê (1925-F.N.) de Xalit Beg ji teref Tirkan ve hat girtin û ew dan mahkema leşkerî ya Bedlîsê. Mahkeme ew makûmê girtinê kir (çiqas hukum danê nizanim). Zêdetir dema Xalid beg anîn Bedlîsê tirk tirsiyan. Ji bo layengerên Xalid begê li dijî wan serîhilnedin, ew di herêma nufûza wî lê hebû derbas nekirin. Ew di ser Sariqamiş û Alaşkert re anîn Bedlîsê. Li gel wê jî dibêjin eger ne zivistan ba ya nerazîbûn û kelecana kurdan ya li dijî girtina Xalid begê dikarîbû anha rê li serhildanekê veke.

Wergera ji Rûsî: Fewzi Namli

2019- 12